

Te mafê îqameyê bo Fînlandayê wergirtiye

Daîreya Koçberan biryareke erênî li ser dawaya te ya penaberiye daye. Ew tê wê wateyê ku te îqameyê demkî bo Fînlandayê wergirtiye.

Yekser behsa biryara xwe bo alîkarê huqûqî û karmendekî navenda penaxwazan bike

Alîkarê te yê huqûqî û navenda penaxwazan bi otomatîkî agahiyê ji biryara te wernagirin.

Giring karmendekî navenda penaxwaziyê haydar ku te biryarek ji Daîreya Koçberan wergirtiye. Karmendê navendê dikare hingê te şîret bike ka ji wê demê pê ve çi dibe.

Herwiha ji alîkarê xwe yê huqûqî re bibêje ku te biryarek ji Daîreya Koçberan wergirtiye.

Li gel biryarê karta îqameyê didin te

Karta îqameyê diyar dike ku te maf heye li Fînlandayê bî. Li ser kartê nivîsiye ka dema îqameya te heta kengî ye.

Kartê winda neke. Eger kartê winda bikî, hingê demekê li xizmetgeha Daîreya Koçberan bigire daku bo te karteke nû çêkin. Karta nû bi pare ye.

Gava ku tu li Fînlandayê bijî, divê te belgeyê seferkirinê ya nû hebe

Li gor qanûna Fînlandayê divê te belgeyê seferkirinê ya nû hebe. Gava ku te belgeya seferkirinê hebe, dikarî ji Fînlandayê sefer bikî derve û vegeî Fînlandayê.

- **Eger mafê penaberiye yan parastina pileya duyem bo Fînlandayê dabe te**

Eger mafê penaberiye yan parastina pileya duyem li Fînlandayê bidin te, dikarî pasporta welatê xwe bi kar binî yan eger hez dikî dikarî belgeyê seferkirinê ya penaberan an pasporta biyaniyan dawa bikî. Nabe ku te hevdem pasporta welatê xwe û belgeya seferkirinê ya Fînlandayê wergirî.

Eger te hê pasporta welatê xwe hebe, divê tu wê bidî Daîrey Koçberan gava ku belgeyê seferkirinê ya penaberan an pasporta biyaniyan wergirî.

Eger te pasporta welatê xwe tine be, divê ku belgeyê seferkirinê ya penaberan an pasporta biyaniyan dawa bikî. Dawakirin bi pare ye.

- Eger mafê penaberiye dabe te, dikarî belgeya seferkirinê ya penaberan wergirî
- Eger parastina pileya duyem dabe te, dikarî pasporta biyaniyan wergirî.

Bizane ku eger pişî wergirtina mafê penaberiye yan parastina duyem pasporta welatê xwe peyda bikî, ew dikare bibe sebebê qutkirin an betalkirina mafê te yê penaberiye yan parastina te ya pileya duyem.

▪ Eger bi sebebê din îqameyê bidin te

Eger ji bilî mafê penaberiye yan parastina pileya duyem ji ber sebebê din îqameyê bidin te, divê ku te pasporteke nû ya welatê xwe hebe yan dawa pasporta welatê xwe bikî.

Dikarî pasporteke biyaniyan wergirî eger bikarî pasportekê ji karbidestên welatê xwe wergirî yan bo wergirtina pasporta biyaniyan sebebê din yê taybet heye. Di wî halefî de Daîreya Koçberan biryar dide ka pasporta biyaniyan bidin te yan na. Dawakirin bi pare ye.

Di biryarê de behsa mafê karkirinê tê kirin

Di biryarê de hatiye behskirin ka te mafê karkirinê li Finlandayê heye. Mafê karkirinê herwiha li ser karta te ya îqameyê jî hatiye diyarkirin.

Tu dibî rûniştvanê bajarekî

Karmenda navenda penaxwazan dê te gazî hevdişînekê bike û li ser neqilbûna bo bajarekî şîretan bide. Ew dê bo peydakirina xaniyekî alîkariya te bike. Tu dikarî bi xwe jî li xaniyekî bigerî. Behsa planên xwe li gel karmendek navenda penaxwazan bike.

Di dema neqilbûna bajarekî de karûbarên te li Dezgeha Sîgortaya Neteweyî (Kela), daîreya kar û aborî (TE-toimisto) û daîreya Digi û nifûsê tînen meşandin. Pişî neqilbûnê tu êdî ne mişteriyê navenda penaxwaziyê yî. Xizmetên te yê tenduristiyê û sosyalê jî aliyê bajarê te ve tînen dayîn.

Dikarî bêyî destûreke cuda bibî xwandekar

Dikarî dawa cihekî xwandekariyê bikî û cihekî wisa qebûl bikî. Bo xwandekariyê ne hewceyî destûreke cuda yî.

Dikarî herwiha ji polîs karta nasnameyê dawa bikî

Dikarî ji polîs dawa karta nasnameyê bikî ku belgeyê fermî ya nasnameyê ye. Ew meşandina karûbaran li Finlandayê hêsantir dike. Belgeya nasnameyê bo nimûne bo vekirina hesaba bankê li Finlandayê hewce ye. Dawakirin bi pare ye.

Bizane ku belgeya seferkirinê ya penaberan yan pasporta biyaniyan ne belgeyên fermî yê nasnameyê ne heta hingê jî gava ku nîşana misogernekirina nasnameyê li ser nebe jî. Agahiyên zêdetir derbarê misogerkirina nasnameyê li ser malpera Daîreya Koçberan hene: migr.fi/henkilollisyys-varmistamatta.

Niha endamên malbata te dikarin dawa îqameyê bo Fîrlandayê bikin

Di qanûna Fîrlandayê hatiye diyarkirin ka kî endamên malbatê wisan in ku dikarin dawa îqameyê bo Fîrlandayê bikin. Şertên wergirtina îqameyê bo endamên malbatê girêdayî wê ne ka îqameyê çawa wergirtiye. Dawakirin bi pare ye.

Eger mafê penaberiye dabe te, bizane ku şertê dahata misogerkiirî ji endamên malbata te naxwazin eger ew dawa îqameya malbati bikin di heyama sê mehan de ji wê demê ku te biryar wergirtiye. Eger te mafê penaberiye li Fîrlandayê wergirtibe, şîretê li gel biryarê tê ku tê de agahiyên zêdetir hene ka çawa endamên malbata te dikarin îqameyê ji Fîrlandayê wergirin.

Agahiyên zêdetir derbarê dawakirina îqameya endamên malbatê li ser malpera me hene: migr.fi/perheenasenen-luokse-suomeen.

Ji bîr neke îqameya xwe nû bike

Daku bikarî piştî bidawîhatina îqameya xwe ya niha jî li Fîrlandayê bimînî, divê ku berî bidawîhatina îqameya niha dawa nûkirina wê bikî. Îqameya duyem ji Daîreya Koçberan tê dawakirin.

Dawaya îqameya duyem baş e ku li ser internetê were kirin eger mimkin be. Şîretan li ser malpera me bibîne: migr.fi/jatkolupa.

Piştî ku te dawaname dagirt, li ser internetê demekê bigire bo xizmetgehê bi xwevenasandinê yan bi teslîmkirina dawayê. Dikarî xizmeta demgirtinê li ser malpera me bibînî: migr.vihta.com.

Misoger bike ku her tiştê hewce bi te re ye gava k utu (ku tu) werî xizmetgehê. Şîretên meşandina karûbaran li xizmetgehê li ser malpera Daîreya Koçberan bixwîne: migr.fi/nain-asioit-palvelupisteessa.

▪ Eger mafê penaberiye yan parastina pileya duyem dabe te

Eger mafê penaberiye yan parastina pileya duyem dabe te, belkî bikarî yekser piştî îqameya yekem, îqameya daîmî wergirî. Hewce ye ku hingê tu çar salan li Fîrlandayê jiyabî.

Agahiyên zêdetir li ser îqameya daîmî ji malpera me: migr.fi/pysyva-oleskelulupa.

Eger dawa îqameya duyem an belgeya seferkirinê bikî û agahiyên te yên têkiliyê biguherin, Daîreya Koçberan zû agadar bike

Divê ku tu Daîreya Koçber ji agahiyên xwe yên têkildanî û guherîna wan agadar bikî gava ku dawaya te li Daîreya Koçberan be. Di dema meşandina dawaya te de Daîreya Koçberan dikare bi posteyê nameyan ji te re bişîne yan nameyekê bişîne û diyar bike ku şandiyek ji te re hatiye ku divê tu biçî cihekî wergirî û navê wî cihî diyar dike.

Eger te dawaya xwe bi elektronîkî kiribe, agahiyên xwe yên têkildanî li ser malpera Enter Finland biguherîne: enterfinland.fi

Eger te dawaya xwe bi kaxezî dabe, agahiyên xwe yên guherî li ser formekê bide ku li ser malpera me heye: migri.fi/muutoksista-ilmoittaminen. Formê bi posteyê bişîne daîreyê yan dema vekirîbûna xizmetgeha Daîreya Koçberan bîne wê derê. Formê bike namedankeke û têxe sindoqa posteya xizmetgehê.

Mafê te yê penaberiye yan parastina pileya duyem dikare di hin haletan de were qutkirin an betalkirin

Mafê te yê penaberiye yan parastina pileya duyem dikarin bîn qutkirin û îqameya te bêt betalkirin eger bo nimûne tu sefer bikî welatê xwe yan pasporta welatê xwe peyda bikî.

Mafê te yê penaberiye yan parastina pileya duyem dikare bêt betalkirin eger te agahiyên şaş an xapîner dabin karbidestan ku tesîr li biryara te kiribe.

Li gel biryara qutkirin an betalkirinê Daîreya Koçberan lê dikole ka sebeb bo îqameya te hene. Hingê Daîreya Koçber herwiha biryara wê yekê jî dide ka dikarin te ji Fînlândayê derxin û biryara qedexekirina hatina welatê bidin te yan na.

Tawankarî dikare bibe sebebê wê yekê ku dîsa biryareke nû li ser mafê te yê penaberiye yan parastina pileya duyemê bidin. Biryar dikare bibe sebebê qutkirin an betalkirina mafê penaberiye yan parastina pileya duyemê û derxistinê.

Dikarî paşê dawa welatîniya Fînlândayê bikî

Dikarî dawa welatîniya Fînlândayê bikî gava ku tu çar an pênc salan bê navbir li Fînlândayê jiyabî. Dema jiyane ya şert li gor wê ye ka bi çi sebebê îqame daye te û herwiha zanîna te ya fînlândî yan swêdî divê li gor şertên diyarkî be. Şertekî welatîniyê jî ew e ku nasnameya te bi misogerî hatibe ronkirin. Divê ku tu ji aliyê aborî ve debara xwe li Fînlândayê bikî. Tawan dikarin bibin rêgir li ber wergirtina welatîniyê.

Agahiyên zêdetir wergire

- Ji malpera Daîreya Koçberan: migri.fi/turvapaikka-suomesta
- Vîdyoya Daîreya Koçberan ya "Biryara erênî": migri.fi/video-turvapaikanhakijoille